**Iraq**
**27 adar 2004**

## Ji ber "devavêtin"a di internêtê de 18 meh zindan li welatiyekî nemsawî yê bi esil kurd hatin birîn

Li welatiyê nemsawî yê bi esil kurd, Kamal Sayid Qadir, ku berî pênc mehan ji ber weşandina nivîsarên "devavêtin"ê li ser dezgehên hikumî li Kurdistana Iraqê hatibû girtin, 18 meh zindan hatin birîn. Di dadgehkirineke berî niha de, ji bo heman tawanê 30 sal zindan lê hatibûn birîn, lê ev biryar piştre hate bipaşxistin.

Peyamnêrên Bêsînor got ku cezakirina Kamal Sayid Qadir berevajî pîvanên navneteweyî yên azadiya derbirînê ne. Rêxistina azadiya çapemeniyê got: "Her cezakirina zindanê ji bo derbirîna nerînê nayê pejirandin, eger di meseleyên birîndarkirin an devavêtinê de be jî. Em haydarî pêkanîna sîstema dadê ya kurdî ya iraqî ne, ku bi birîna 30 sal zindan li vî qanunzanî dest pê kir, piştre ev ceza li ser 20an paar kir, lê tawan wekî xwe ma. Em hêvî dikin, ku dadgeha temyîzê dê vê biryarê bi paş xîne û wî azad bike."

Cezakirina wî li jêr xala 433ê ya madeya 111ê ji sala 1969ê ya qanunên cerîmeyan, ku ji bo devavêtinê ta pênc salan zindan dixwaze, pêk hatiye. Agahiya ku qanunzan Kamal Qadir endamê malbatekê ye, ku di dema rêjîma Sedam Hisên de "24 Şehîd" dane, ji aliyê dadgehê ve wekî semdeke ji bo sivikkirina cezayê hatiye dîtin. Govend Baban, Parêzerê wî, ragihand Peyamnêrên Bêsînor ku madeya di qanuna cerîmeyan de tenê dikare bête bikaranîn, eger gilî ji aliyê kesekî ve û ne ji aliyê dezgeheke hikumî ve bête kirin. Wî berdewam kir û got ku dadgeha li Hewlêrê ne şareza bû ku vê dozê bi rê ve bibe, ji ber nivîsarên devavêtinê li Nemsa hatibûn weşandin. Miwekilê wî bi her awayî li dijî vê biryarê derket, ku "ne dadmend" û "siyasî" bû, wek ku wî ew bi nav kir.

Kemal Seyid Qadir ji 26.10.2005ê ve di zindanekê de li Hewlêrê li herêma Kurdistanê ya autonom li bakurê Iraqê girtî ye. Di 19.12.2005ê de, ji ber "devavêtina dezgehên fermî" hatibû cezakirin, lê piştre ev biryar

hate bipaşxistin. Di axavtinekê de, ku di malpera kurdishmedia.com de hate weşandin, qanunzan li xwe mûkir hat, ku wî hin tişt gotibûn, ku li hemberî hin kesan di nivîsarên wî de “ne di cî de bûn”.